# PÊŞGOTIN

Mılleté Kurd, Mılletéké tarîxî û kevne. Ew xwehîyé medenîyet û dewlet bû. Ev rastîya dîrokî nayé veşartın.

Dı jîna mılletan de devrén ketî û tarî hene. Van demande carna millet hında dıbın, em dı rûpelén tarîxade wan mılletan dıbînın.

Bındestîya mılletan ne hındabûne, lewra hındabûn: Tarîxa millî, Ezînîya millî, Harsén millî û Zımané zıkma kî bîrvakırıne. Mılleté Kurd, xwe hında nekırîye û sıtûné wîyén millî dı cîdane. Lewra Mılleté KURD DIJI.

Lé belé ev jîyan ne jîyanékî serfıraz û azayîye.

Kurd, îro bındestın. Heqqén mırovanî û millî jé hatıne sıtandın. Daxwazame û dozame: Mılleté Kurd, wek milletén CIHANE azad û serfırazbî.

Dı bona pékanîna ARMANCE:

(PARTIYA DEMOQRATA KURDISTANA TIRKİYE)

hatîye danîn. Xebata Partîyé, rexékî AŞTI, Demogratî, Mırovanî û Komelayîtî dımeşe.

Partî, Parastîyé "Mîsaqa Millîye". Lewra Partî, bawerîyé bı yekîtî û bırayîtî û hemberîya Kurd û Tırk'a tîne.

Partî, alîkaré hemî Mılletén ésîre, Partî yekîtî û hımberîya hemî mılletan qebûldıke. Hevketına Mılletande aştî dıxwaze û bawerîya Felsefî, DIN'î û fıkrîde, herkes aza û serbest dıgre.

Partî, bı "PEYMANA MILLETEN YEKBÛYI" ve, gırédayîye. Û bı her aweyî xwînméjîyé (sümürgeyîtîyé) naxweze û red'dıke.

Dı neqeba rézén Mılletîde, mucadeleyékî gureşî qebul nake.

Partî lı alé nîzama HUQUQIYE, lé belé dı ğespa heqqén ınsanî û millî de, ber'rabûn û gûreşîyé nîşandıde.

PARTIYA DEMOQRATA
KURDISTANA T I R K İ Y E

Madda:1-Navé Partîyé "Partîya Demoqrata Kurdıstana Tırkîyé".

Madda:2-Daxwaz û dozén PARTÎYE :
Partî,dıxwaze lı Cumhûrîyeta Tırkîyé'da,heqqén Sîyesî,Iqtîsadî û Zanyarî (kültürel) jı Millé-té Kurd're bıde naskırın.

Madda:3-Jıbo pékanîna van şertan:

a)Lazıme dı ANAYASA Tırkîyé de,bı cî bıbe kû: "Dewleta Tırkîye'yé jı Kurd û Tırk'a çébûye û ev herdû MILLET dı her aweyî de wekhevın."

b)Dı Parlemana Tırkîyé da,lıgora nıfûsa xwe Kurd téne temsîlkırın û dı HEY'ETA WEKILADE cî bıs-tînın.

c)Tıxûbén Kurdıstana Tırkîyé bé kıfşkırın û dı axa Kurdıstané de tû mıhacır neyén bıcîkırın. Navén gunda û bajarén Kurdan neyén guhar-tın û yén kû hatıne guhartınjî,navén xweyén kevın bıstînın.

ç)Dı herémén Kurdıstané de,Walî,Serekén Idarî, Edlî û gış Memûr jı Kurdan çébın.Tor û Adetén Kurdan dı qanûnade bıcîbıbın.

d)Dı Kurdıstana Tırkîyé de,zaré resmî bı Kurdîbî.

e)Dı Bîhîstanén Kurdıstan'é de,xwendın bı zaré Kurdîbî,lé Tırkîjî bé hînkırın.Ünüversîta Kurd-ıstané bé danîn.Xwendayén xîzan jı alîyé dewle-téve bıdıne xwendın.

f)Lı Kurdıstané de Radyo û Telewızyon bı zımané Kurd'î vebın.

g)Kıtab,Kowar û Rojname bı zımané Kurd'î bén çap-kırın.

h)Jı zanyarî (ılım) û îbadeta DINI'RE,Mela û IBA-DETXANEYÊN lazım bı desté dewleté,bé kémayî bén pékanîn.

Madda:4-Partî dıxwaze Dewlet,azayî û serkeftın û péşve çona Kurdıstané,bılez û bı ber'rî destpébıke.

JIBO PEKANINA VA:

a) Jı gundîyare: xanî,erd,tov û qırédî pékbîne. Çandın û fırotına tıtûné serbest bıke.

b) Jı bo karker û cotker û palare : Şuxul û kar peydabıke.

c)Jı esnaf û bezırgana're:Qırédî zéde veke.
d)Bıcîkırına koçeran lı deşt û zozenan.Temînkırına çéré û debaré jı terşeware.

Madda:5-Çékırına ré,sed,baraj,fabrîqe û sınet'én gıran û nexweşxanan.

Madda:6-Petrol û Meden,bón dermıstın û dı welaté Kurdıstané de bé teşfîyekırın.

Madda:7-Pétrol û Medenén lı Kurdıstané dertén,lazımê 0/0 75.karéwan lı Kurdıstané bé xerckırın.

---

## H O N A N D I N A (teşkilata) PARTIYE :

Madda:8-Jı bo pékanîna ARMANCA PARTIYE,Partî bıvî aweyê jér hatîye honandın:

a-) Cıvîna Mezın.
b-) Koma NAVKOM
c-) Koma Herémî
d-) Koma Cî
e-) Koma Arîker
f-) Koma Bıra

Madda:9-CIVINA MEZIN:

a)Cıvîna Mezın,jı dû azayén Koma Navkom û/komén Herémî dû azayén bıjartî û bı Sereké Partîyéve té meydané. jı her
b)Cıvîna Mezın,an dû salan carék,yanjî nexwe bı fermané Sereké Partîyé,yanjî bı qırara jı 2/3 azayén Koma Navkom komdıbe.
c)Cıvîna Mezın,bılıntıre jı hemî komén Partîyé.

Madda;10- SELAHIYET û VEZIFEYEN Cıvîna Mezın:

a) Guhartın û navdanîna Partîyé.
b) Guhartın û helçınîna Sereké Partîyé û azayén Koma Navkom.
c) Nîşandan û kıfşkırına rîya Partîyé.
d) Qontrola xebata Koma Navkom û butgé Partîyé. Betalkırına qırarén Koma Navkom.
e) Jı halé rakırına (fesha)Partîyé.

Madda:11- K O M A N A V K O M :

a) Pıştî Cıvîna Mezın,Koma Navkom mezıntıre jı hemî Komén Partîyé.
b) Bona pékanîna ARMANCA Partîyé,hemû xebat û şolé Partîyé dajd û wé goré koméndîtır dıde xebıtandır.(dı neqeba herdû cıvaté Cıvîna Mezın de)

Madda:12- Koma Navkom, 11/13 azayén kû Cıvîna Mezın bı-jartîye tê danîn.

Madda:13- Wesfén Azayén Koma Navkom:

a) Dıvé emréwî ne kémî 25-Sala bî.
b) Dıvé bı hındıkayî 4-Sala dı Partîyéde xebatkırıbî.
c) Dı jîna xwe û xebata xweya Partîyéda ÇAK û Kamiranî bî.
d) Xweyî hısyet û ceref bî.

SELAHİYET Û WEZÎFEYÉN KOMA NAVKOM :

Madda:14- Koma Navkom jı nava xwe sekreterék û çar aza yén Mekteba Sîyasî dıbıjére. Jı bo meşandın û pésveçona Partîyé, Qomîta péktîné.

Madda:15- Qırarén Cıvata Mezın bı cî tîné.

Madda:16- Jı bo péşveçon û zexımbûna Partîyé, qıraran dıstîne û pékanîna wan qıraran dıxwaze û qontıroldıke.

Madda:17- Dılman û hevketına neqeba azayén Partîyé, neqeba aza û Mekteba Sîyasî û neqeba Mekteba Sîyasî û Komé dîde heldıke.

Madda:18- Serfkırına perén Partîyé kontroldıke.

Madda:19- Lı pêşberé Partîyén Sîyasîyén dı Tırkîyé de, Sîyaseta Partîyé tesbîtdıke.

Madda:20- Lı péşberé fıkrén Siyasi, Iqtîsadî û Komelîyén cîhanîde fıkra partîyé kıfşdıke.

Madda:21- Lıgora NIZAMÉ, karker û cotkerén Kurdıstané hégyardıke.

Madda:22- Pékanîn û derxıstına rojnama, û kowara; belavkırına beyanata û kıfşkırına heyeta jıbo va qerara're.

Madda:23- Bersûwa pırs û gılîyan, helkırına ğayîleyén Partîyé.

Madda:24- Kıfşkırına Cî û Zemané CIVATA MEZIN û rojnama Cıvîna Mezın.

Madda:25- Tesbîta Usûla delegeyén Cıvîna Mezın.

MaddA:26- Betalkırına qırarén komén jı xwe nızımtır.

Madda:27- Danîna Komén Cî û Herémî.

Madda:28- Hısaba Mekteba Sîyasî datîné û wezîfeyén wî nîşandıde.

Madda:29- Jı cem xwe dıkaré 1/2 aza jı Komén Cî û Herémîre tayîn bıke.

Madda:30- Dıkaré jıbona xwortkırına teşkîlaté û pékanîna ARMANCA Partîyé: Qasıd, Árîker û Şehna bıgeyne bo hemî koman.

Madda:31- Koma Navkom, 2-meheم carék; yan gava lazımî hebî komdıbe.

Madda:32- Azayén dı rîya xebata Partîyé de, hepıs, an
nefî bıbe; yan dûrbıkeve cîyéwî té parastın.

Madda:33- Mekteba SİYASİ: Mekteba Sîyasi, jı Sekreteré
Koma Navkom û çar azayén kû Koma navkom jı
nav xwe bıjartıye té danîn.

Madda:34- Mekteba Sîyasî, qırarén Koma Navkom tîné cî,
çuhartına siyaseta partîyé kû lazım bıbe;
Koma Navkom cıvate. Gava cıvata Koma navkom
Koma Navkom cıvate. Gava cıvata Koma navkom
pékneyé, wé gavé Mekteba Sîyasî şuglé Partîyé
dıbîné, xebata Partîyé dajo.

Madda:35- S E R E K 'E PARTİYE : Sereké Partîyé, Sere_
ké Partî û Koma Navkome. Xweyé heqqe kû rîya
û fıkra nîşanî Koma Navkom û Mekteba Sîyasî
bıde. Cıvîna mezın û Koma Navkom, dıbın serekîyé
wî de komdıbın.

Madda:36- S E L A H I Y E T A S E R O K :
a)-Dı ehwalén mûhîmde.
b)-Wexté cıvata Cıvîna Mezın borîbe.
Dıkaré béyî qıraré Koma Navkom, Cıvata
Cıvîna Mezîn kombıke.

Madda:37- SEKRETERE KOMA NAVKOM : Sekreteré Koma Nav-
kom, bı azayén Mekteba Sîyasîve mesûle. Şuxlén
îdarî û hemî nıvısandın û emrén partîyé, pış-
tî kû xweyî selahîyet ımzabıkın; dıvé yan dı-
bın ımzayé xwe yanjî dıbın ımzayé arîkeré
xwe de bıde şandın. Hemû şûxlé Partîyé, én Sî-
yasî û tenzîmî dınére. Hemî şûxlé îdara Partî'
yé, lıser mılé Mekteba Sîyasîye. Azayén Mekte-
ba Sîyasî, lıgora ıxtîsasa xwe heryek lı îşék
dınére. Sekreter, hemû şuxlan nîşanî azayén
Mekteba Sîyasî dıde. Lé belé nıkaré bı seré
xwe qıraran bıde.

Madda:38- K O M A H E R E M I :Dı herémé kû Koma Nav-
kom kıfşkırîye Koma Herémî té danîn.
a)-Koma Herémî 5/9 azayén kû Koma Navkom
bıjartıbî datînın.
b) Dû heyva caréké Koma Herémî komdıbe.

Madda:39- Koma Herémî, jı nav xwe sé aza dıgré; jıwan
yek Sereké Koma Herémîye. Serek, bı herdû heval
én xwe ve xebata Koma Herémî péktîné. Dıvé
Koma Navkom, Sereké Koma Herémî teswîb'bıke.

Madda:40- Bı destûrdana Koma Navkom, Koma Herémî dıkaré
rojname û kowaréк derînın.

K O M A C Î

Madda:41-Koma Cî,jı 3/7 Serekén Komé Arîker;lıwî cîyé
kû Koma Navkom daye kıfşkırın,bıdesté Koma Her
émî té danîn.Dıvî cîyîda Partîyé Koma Cî tem-
sîldıke.Mesûlé îdare û xebata Partîyéye.Lıwî
cîyé xwede,emrén kû tén péktîne û wan emrûr
xebatén Partîyé lıgora Nîzamé dımeşîne.

Madda:42-Wezîfe û Selahîyet.n K O M A C I :

a)-Şol û xebaté lı cîyé xwe tesbîtdıke,bo pékanî
na va,qırara dıstîne,wezîfeyén Koma Arîker û
Komén Bıra,réwan dıde.Û jı bona xebata wan,ré
nîşandıde.

b)-Sereké Koma Cî û tı-dû alîker ve jınavxwe dı-
bıjérın.

c)-Lazıme Koma Navkom,Sereké Koma Cî qebûlbıke
"teswîb".Wexta qebûl nekır,dıvé Koma cî Sere-
kék dî kıfşbıke.Vé caré Koma Navkom,jı Sereké
nû û yé kevın -jı herdûka yekî -qebûlbıke û
qıraré xwe jı Koma Cî're bışîne.

d)-Sereké Koma Cî û dû arikaré wî,lıgora Nîzama-
Partîyé emré jı Komén mezın hatın û qırarén
Komén Cî've,pékbînın û Partîyé lıwî cîyî îda-
re bıkın.

e)-Dan û sıtandın dınavbera Koma Cî û Koma Heré-
mîZZ,bı desté Sereké Koma Cî té pékanîn.

f)-Jı xeyrî Sereké Koma Cî,azayén komé heryek
Sereké Koméké Arîkere.

g)-Koma Cî mehé caréк dıcıvé û dıwé mehéda tış-
tén kû lıcîyé wan.bûne lıser dıskının.Jıbo
wan bûyîya tedbîr û qıraran dıstînın.Hedîse-
yén kû gelék mûhîmın û xebera Partîyé jé tıne
dıvé Koma Herémî pé bıhısînın.

h)-Bersûwa pırs-û-pırsîyarén Bıra,dıde û yé bıke
vé Koma Bıra,dı héqqéwîda qırara dıde.

î)-Bınas û xetayén Komén Arîker û Bıra hebın,dı-
karé XXXXXXX bınasé wan bıwan bıde zanîn.
An tezîr bıke.An hexwe heta geş meha wan jı
Partîyé dûrbıke.Gava avétına wan jı Partîyé
-lazım bıbî,dıvé destûr jı Koma Herémî bıxwe-
ze.Lıserwî Koma Herémî,azayék jınav xwe dıke
Şehne'yé tehqîqaté û lı gora rapora Şehne,
2-3 azayén Koma Herémî qırar dıde,paşî ew
aza jı Partîyé té avétın.

j)-Heyvî(afdat) û heqqén rojnama û kowaran,ber-
hev dıke û jı Koma Herémîre dışîne.

k)Sé mehan carék,xebata xwe jı Koma Herémîre dıde zanîn.

Bersûwa pırsén Komén jı xwe jortır dıde

KOMA X- ARÎKER :

Madda:43-Koma Arîker,jı azayéké Koma Cî û çar azayén Arîker té danîn.

a)..Azayé Koma Cî,Sereké vé koméye.

b)..Pıştî kû Koma Cî cıvata xwe kırış paşwîre her aza arîkerén xwe dıdehev û qıraré Koma Cî jıwaré dıbé û dıde zanîn.

c)..Wezîfén Koma Arîker,eve kû:Emr-û-wezîfeyén kû Koma Cî,jı Koma Bıra're daye kıfşkırın û pırs-û-pırsîyarén Komén Bıra,jı Komén Cî'ra.

ç)..Heyvî (aîdat) û heqqén rojnama û kovaran bıde hev û teslîmî Koma Cî bıke.

d)..Jı Şeyrî Sereké Koma Arîkar,tû azayén vé komé nıkarın aza û sereké Koma Cî nasbıkın.

e)..Azayén Koma Arîkar,dıvé hındık saléki dı Koma Bıra/de xebıtîbî.

f)..Bé qırar Koma Cî,azayén Koma bıra;bılındé Koma arîkar dıbın.

KOMA BIRA

Madda:44- Koma Bıra,jı 3.Kesa çédıbî.Yek jıwan XXXXXX hersîyan Sereké Koméye.

ż — Serek,guxlû xebata komé dımeşîne.Koma Bıra xîmé honandına Partîyéye.

a)..Koma Bıra,lıgora Nızama emré Partîyé jıbo xwurtbûn û zexımbûna Partîyé dıguxule,xebat dıke û fıkra Partîyé lınav Milleté xwe belavdıke.

b),,Heftîyé carék Koma Bıra dıcıve,bı cîanîna wezîfan çavnér dıbî,wezîfén wé heftîyé lınav azan belavdike.

c)..Bendewara jı Partîyé're peydadıke û ARMANCén Partîyé bıwan dıde zanîn.Milleté xwe lıgora fıkra Partîyé hêşyar dıke.

e)..Emr-û-wezîfeyén jı alé Partîyé've,jére hatı ne kıfşkırın dıvé bîné cî.

f)..Ehwalé MILLET bı Partîyé dıde zanîn.

g)..Heyvîyén Bıra û Bendewar'a,heqqé kowar û rojnama XXXXXX û teber'rûan dıde hev û jı Koma Arîker're dıgeyne.

h)..Beyanat û rojname û kowarén Partîyé,dıde belevkırın.Dı heqqén wan de fıkr-û-daxwazén

xwe jı Koma Jor're dıdıne zanîn.
î)..Piştî salék an sal-û-nîv Bendewaré kû lafgb.
jıbo Bıra'yîtîyé jı Koma Cî're dıde zanîn.
ı)..Mehé carék lı heqqén xebata xwe de,Koma Arîker bıde serwextkırın.
j)..Bezjékırına neqeba xwe û Mılleté xwe zédedıke, jıbo kû ehwalé Mılleté bızané û bıkarbî fıkrén Partîyé bıwan baş bıde zanîn.

B E N D E W A R :

Madda:45-Dınav Millet de,yé kû meyla wî lı ser mıllet heye û dı exlaqé xwe de başe,ew kes,dıkaré jı Partîyé're bıbe BENDEWAR.

Bendewar'jî,wekî azayén Partîyé,emrén Partîyé tî nıne cî û bedelé xwe dıdın.Ew jî wekî azayén Partî sır û menfîetén Partîyé dıparézın.

---

WEZIFE'EN AZAYEN P A R T 'I'Y E :

Madda:46,-Azayén Partîyé,Péşmerge'yé ARMANC û şuxlé Partîyéye.

a)-Emré Partîyé dıvé bé kémayî bîné cî.
b)-Dıvé her-û-her yekîtîya nava Partîyé û navbeyna Millet û Partîyé bıparézé.
c)-Dıvé jıbona zanyarîya xwe û ya hevalé xwe bıxebıte.
d)-Dıvé kémahîyén xwe û hevalén xwe jı Partîyé're bıbéje û tû tıştî jı Partîyé venegére.
e)-Dıvé rabûn û rûnıştına xwe bı xelqére zédeke û goh bıde fıkr-û-xwestekén mıllet û heta jî bı bıxwe yen bı alîkarîya Partîyé,hevketın û dılman û derdén mıllet dermanbıke.Lı gore fıkrû Armancé Partîyé mılleté xwe hêşyarbıke.
f)-Dûbendî û qûmpanîyan jı nav mıllet rake,yekîtî û bırayîtîya ferd û malbatan;neyartîya neqeba eşîran rake û dınava mıllet de AKTIYE bıcîbıke.
g)-Dıvé bé emré Partîyé nekevé tû Partîyén Sîyasî. û wezîfeyén resmî.
e)-Dıvé bé destûra Partîyé,cî û herémén xwe neguhêrîne.

ŞERTEN KETINA PARTIYE :

Madda:47-a),Dıvé Nîzama Partîyé bıxwîyne û armanc û fıkrén Partîyé qebûlbıke.
b)-Dıvé dı komén Partîyé de xebaté qebûl bıke.
c)-Dıvé emré'wî jı 17-Sala kêmtır nebî.Û xwezanbî.
d)-Dıvé rastbî,qencbî û bışeref-û-namusbî.
e)-Dıvé ne xweyé fıkrén zıddé ARMANCA Partîyé be.
f)-Dıvé tûcar xîyanet bı MILLETE KURD'RE nekırıbe.

g)-Dıvé ne xweyén fıkrén bîyanîyén mılletbe.
h)-Dıvé jı derbé û jı kar neketıbe.
î)-Dıvé Millet paréz û siyaset zanabe.

MADDA:-48.Dıvé yé kû bıkevé Partîye sond bıxwe.

a)-Çaxa bıkevé Partîyé lı gora taketa xwe hınék pere bıde.
b)-Her meh,heyvîya xwe bıde.
ç)-Heyvî (afdat) Mámayî,1.- û pırayî 100.- banqınot peré Tırkîyéye.

<u>SERTEN derketın û AVÉTIN JI PARTÎYE :</u>

Madda:49-Her azagava bıvé,bı destûra partîyé dıkaré jı Partîyé derkevé.

a)-Destûra derketına aza bıvî aweyîye:Jı Bıra'ra,Koma Cî.Jı Arîker û Koma Cî'ra Koma Herémî,jı azayén Koma Herémîra Koma Navkom,jı Koma Navkom û Sereké Partîyére Cıvata mezın ızındıde.
b)-E kû bé ızna Partîyé derketıbın û carékédî dıvén bıkevıne Partîyé; cîyé wîyé kevıı çîbe nıkaré bıgré.Ancax qıraré Koma Navkom,wekaBendewar, dıkevé Partîyé.
d)-Yén jı alé Partîyé've,jıbona wezîfeyékî jı Partîyé derketıbın,pıştî wezîfa wî xılasbıbî dıkaré bıkevé cîyé xweyé beré.
e)-Yén bé ızna Partîyé jı Partîyé derkevın,weka yén jı Partîyé tén avétın bıwanre muamele té dîtın.

Madda:50- <u>A V É T I N JI PARTÎYE</u> :Dıvan halén jérda aza jı Partîyé té avétın:

a)-E kû sıré Partîyé daye derve û eşkere kırîye.
b)-E kû lı zıddé ARMANCA Partîyé çoye.
d)-E kû wezîfeyén Partîyé daneyé bé uzur nanîye cî,
e)-E kû şert û wesfén ketına Partîyé wındabıke.(weka şertén madda-49'a)
d)-E Kû sé mehen lı peyî hev an dı salé de sé mehen heyvîya xwe nedabî.

Madda:51-Qıraré avétıné jı Partîyé wıhaye:

a)-Jı Koma Bıra û Koma Arîker're,Koma Herémî,
b)-Jı Koma Herémî û Koma Cî're,Koma Navkom qırar dıde.
c)-Ancax,qıraré avétına azayén Koma Herémî,dıvé jı alé cıvata Mezın've bé tezdîqkırın.
d)-E kû jı Partîyé bé avétın,carékédî nıkaré bıkevé Partîyé.

## Madde'én Mûwaqqet:

Madda:1-Heta Cıvata Cıvîna Mezın,hemû wezîfe û selahîyetén Koma Navkom û Cıvîna Mezın dı desté damezrandowandeye.

Madda:2-Heta 5-Sala yé'kû Partî damezrandıne, dıkarın Cıvîna Mezın komqekın.

TI DEMOQRAT
STAN TIRK

| | | |
|---|---|---|
| SEREK | SEKRETER | MUHASIP |
| ZINAR | PEŞMERGE'Ê WELAT | EVINDAR'Ê WELAT |
| AZA | AZA | AZA |
| DOHNAS | JIREK | BENDE'Ê WELAT |

---